

# **Nameya Ji Şah Re**

**Tonke Dragt**

**Ji Îngilîzî û Hollendî: Kawa Nemir**

Nexşeya îllustratîv: **welatê Unauwenî**  
**yê li rojavayê Çîyayên Gewre**

Nexşeya îllustratîv: **welatê Dagonautî**  
**yê li rojhilatê Çîyayên Gewre**

*Rewayî sê stêrkên li rojava*

# **Nameya Ji Şah Re**

**Tonke Dragt**

**Ji Îngilîzî û Hollendî: Kawa Nemir**



## NAVEROK

*Name ji Tonke Dragtê bo xwîneran 5*

Siwarçakên Şah Dagonautî

BEŞA YEKEM Erkdarkirin 9





## *Name ji Tonke Dragtê bo xwîneran*

Kêfa min hat gava ku min bihîst Netflixê dil heye rêzefilîmekê ji *Nameya Ji Şah Re* berhembîne. Berhemhênanekê bi vî çendî berfireh rêyê xweş dike ku filîm li deverên perošbexş bihê kişandin û çîrokê vedijîne bo cemawereke berfireh.

*Nameya Ji Şah Re* cara pêşîn di 1962yan de weşîya. Wê hingê, serê her polekê her hefte saetekê, di sefên pêncem û şeşem (niha sefên heftan û heştan) ên dibistanên cîyawaz de min “mamostayî” dikir. Min her roj mamostayî nedikir; min dixwest bi têra xwe dema min hebe da ku ji xwe re xet û nîgaran bikêşim, her wiha binivîsim. Min bi dest xwe re fam kiribû, giring bû dersekê çawa dest pê dikir: heke gengaz bûya bi aramî... Û ji wê yekê re piçek hewildan divîya, ji ber ku belavkirina kaxizan û kerese yên xetkêşanê exlebe dirêjtir dikişand ji wê yek xuleka ku hê bêdengî zal dibû û zarokan hemûyan xwe dida guhdariyê. Xweşbextane, ez zû pê hesiyam ku bes yek tişt bi kêr dihat: VEGÊRRAN. Erê, ma çima min sparteka xetkêşanê tevî çîrokekê nedida?

Divîya ew çîrok perošîner bûya, bi gotineke mayîn, divîya tişteke hebûya ku lê bihata zêdekirin, divîya çîrokê best rakira. Carinan min çîrokek ji xwe re digirt ku jixwe hebû, serê pêşîn min hangava berê xwe didayê û dixwend û ez pê de diçûm. Pîrr û gelek caran min bi xwe tişteke li hev dianî, tişteke hema ji xwe ber çêdikir. Ez pîrrî caran disekinîm berîya ku çîrok kuta bibûya; axirî, divîya bi têra xwe dema me bimaya da ku xetêke bedew bihata kêşan. Wekî din jî: da ku bo hindêk şapînozîyan dawîyeke baş bihata peydakirin... ku her carê ser nedigirt. Min jî bi wê yekê dizanibû!

Di gel wê hindê, çîrokeke dawîya xwe nîne – bi şertê ku perošbexş bûya – ‘eyan dibû ku gelekî bi kêrî min dihat. Ji ber ku wê hingê dest dida te bigota: “Heke hûn *bi xweşîkî* xwe bi boçîkê ve bidine xebatê û bikin her çi yê ku ji we bê, ez ê bibêjime we bê ka çîrok çawa diqede.”

Û paşê, rojekê, dîwarên polekê bi nîgarên rengrengî yê keleşan û dêran, yê siwarçakên her yek jê li ser piştê hespê xwe û banûyên pordirêj tev hatin nexşandin. Rîprodakşin û fotraf bûn, ne ku xetkêşan; lê hê ew ne tişteke bûn. Li ser daxwaza mamostaya ku di dîroka de qala Serdema Navîn dikir, min bi xwe gelek ji wêneyan anîbûn. Gotî ez vê jî bibêjim ku dîroka xetkêşanê jî dê biketa kirasê demê, wekî ew yek jî beşeke çîrokê bû. Her wiha gotûbêjeke polê. Gotûbêj der barê *nobeda şevê* de bû, ya ku erka dawîn bû berîya ku dûajoyê siwarçakekî bikaribûya nîşana siwarçakîyê werbigirta. Piştî salên amadekarîyê, qewameke cîyê mereqê, pê re jî bi heft dilan hewesa dilan... Şeva berîya ku di dêrekê yan jî dêrikekê de şerê siwarçakane bikira û bê xew û xûw zêrevanî bikira; destûr tinebû kesê ku dê bibûya siwarçak biketa xewê û gotî wî çu peywendî nebûya li gel cîhana derveyî. Bi gotineke mayîn: çu caran dêrî veneke!

Min der barê dûajoyên siwarçakan ên tével de ji xwe re fentezî çêkirin; tew, bi navekî ku ji nişkê ve hate bîra min, min nav li yek ji wan jî danî: Tiuri. Min ji xwendekarên xwe pirsî bê ka ew ê çu bikin heke yek li dêrî bixe û bi kurtepişt bibêje, “Dêrî veke.”

Ji şikberîyê der – bersiv hema ew bû – ti yek ji wan jî bi wê yekê nexapîya.

“Lê,” min dirêjî bi gotinê da, “wekî kesê li derve, li ber dêrî hewar daxistibe? Wê hingê wê çawa be? Axirî gotî siwarçakekê her tim amade be ku alîkarîyê bike.”

Wekî wisa bûya, mesele dibû tiştêkî din, û piştî ku piçekî dane paş û pêş, zarok hevber bûn, “Baş e, em ê dêrî vekin.” Gelo ji ber ku zarok bi xwe qencîxwaz bûn, lewma? Yan gelo ji ber ku çîroka ku gef dixwar di wir de qut bibe çêdibû bikeve şiklê *serpêhatîyekê*...?

Bi vî awayî, ji binî ve bêyî amadekarîyekê lê di hawirêkî serdema navînî de, çîroka Tiuriyê dûajoyê siwarçakan dest pê bû. Wî bersiv da tikayeke bo alîkarîyê, wisakarî jî wî şerê xwe yê siwarçakane avête ber metirsîyê. Min anî vegêrra. Pê re jî piştî kêmtir ji deh xulekan, hew me dît vî xortî xwe li ser çiqleke darekê veşartibû, çima ku ji ber Siwarên Sor ên razbar û xedar baz dida. Û wê pêlê wî nameyek bi xwe re anîbû, nameyeke nepenî ya giring a ku divîya wî bianîya ji şahekî nenas ê li rojava re.

Çi hebû di wê nameyê de? Çima Siwarên Sor li pey wê nameyê bûn? Der barê wê yekê de ti fikreke min tinebû. Lewma jî ez sekinîm, min nema vegêrra, texeyyula min bi rastî jî çikîyabû. – “Dest bi xetkêşanê bike.” Zarokan hêlehêl rakir. Dawîyê, ez neçar mam ku sozê bidim wekî heke ne wê rojê bûya jî, min ê ‘eseh heftaya din vegêrraya bê çawa çîrokê dirêjî bi xwe dida.

Ew yek ne ku bi tenê niqutîbû dilê xwendekarên min. Hema bêje bo min jî ji şikberîyê der bû ku vê destpêkê gelek derfetên xwe hebûn, dibû ku bibûya kitêbeke tam û tamam jî... Kitêbeke dîtir? Min nivîsîna kitêba xwe ya pêşîn (*Çîrokên Birayên Cewî*, ya ku paştirê bi navê *Zêrker û Dizê Hosta* ji nû ve hate weşandin) kuta kiribû, lê min hê weşangerek peyda nekiribû.

Min soza xwe bi cî anî. Di nava kurtedemekê de me bêtirî derseke xetkêşanê kir; berîya heyama azadanîyê, me devîdevî deh xulekên çîrokeke dirêjepêder a serdema navînî bi dawîyeke meqbûl qedand. Çîrokeke biçûk nisbet bi kitêba di destên we de, lê bi ti awayî ne ku ne tiştêk! Li gorî dema min dest pê kirî, ji wê gavê ve ez bi ser bêtir tiştan ve bûbûm; min pê nizanibû ku nivîsîna tevayîya kitêbê dê devîdevî saleke min bixwara. Ez baş dixebitîm. Berê pêşîn, min dest pê kiribû nexşeyeke şahîşahîyan li her du rexên (= rojhilat û rojava) yê çîyayên bilind durist kiribû. Bo fikrên baş çu tişt ne baştir e ji çêkirina nexşeyên welatên te yê xeyalî. Tu xetên çîyayan û daristanan dikêşî, didî pey şopa ber û deravên robaran, keleşan û hêwirgehên dîtir dîyar dikî, nava li hemûyan dikî, pê re jî tê dihizirî bê ka çî kes in ew ên ku di wan deran hemûyan de dimînin.

Piştî Tiuriyê dûajoyê siwarçakan, Şahê şahîşahîya li rojhilatê Çîyayên Gewre tavilê navê xwe girt. Ew yekî nenas bû û navê wî bi zimanê Îngilîzî UNKNOWN (NENAS) bû. Wî navî piçekî bi cîyawazî bibêjin û bi vî şeweyî binivîsin. Ma qey Unauwen ne navekî hêjayî şahan e?

Şahê welatê navdar ê ku Tiuri lê dijîya, min navê DAGONAUT li wî danî. Dagobert navekî serdema navînî yê pirr berbelav e; di cîhaneke xeyalî de çêdibe bes piçikekî cîyawaz be. Dag-o-naut xweş jî tê guhê mirov, hema hema wek ‘şev-û-roj’ê.

Her wiha min hewil da ku ji bo qereqterê serekî yê kitêbê navekî cîyawaz peyda bikim. Ji şikberîyê der bû (wê hingê ez wisa difikirîm) divîya navekî xweştir, baştir ji TIURI hebûya... Lê ebeden nebû! Ti tişt pê re derneket. Tiuri bes dixwest ku navê wî Tiuri be, ne tiştêkî din. Xebera wî bû. Piştî ew qas demê jî, ez dikim nakim navekî dîtir hê jî nayê xeyala min. Ez navê wî text-bext bi awayê nivîskî bi lêv dikim: TiURI, bi dupatkirina kîteya duyem û ew jî Uyek e.

Çu mişkîle nînin bi navê hespê reş re: Ardanwen. Ardan wateya “şev”ê dide. Anwen peyva bi zimanê Malayî, “angin”ê tîne bîra mirov, a ku wateya “ba” dide û lewma nav wateya Bayê Şevê dide. Navên Tiuri û Ardanwen pê de pê de bi vî awayî hatine peydakirin, lê vejandina mirovan yan jî ajelan di filîmekê de pirr û gelectir arîşeyan bi xwe re tîne. Bo nimûne, ez pê dizanim ku ne kêmtî sê hespên reş di dilqê hespê bi navê Ardanwen de dilîzin. Yek ji wan hespan di tomarên li Zîylanda Nû de tê dîtîn, ku hesp di nava derwaze û bergehên bedew ên şubhê welatên xeyalî Dagonautê û Unauwenê re dibeze. Her du hespên dîtir ji bo tomaarên li Ewrûpayê hatin bikaranîn, ku li wê derê jî derwaze û bergeh û keleşan bedew hene, yê ku dişibine yê serdema navîn. Hespê duyem zehf kedî bû, hespekî xweşik, sernerm û bêteşqele bû ji bo kêşanên nêzepîlanî, gotî bihata niwaztin, perixandin û alif bidanayê. Hespê sêyem, qey hespekî sîrkan bû, di teqîbatan û lêkdanê de, hate bikaranîn.

Ew hespê duyem ez dibêjim qey di kêşana filîmê de bi Laviniayê re hate bikaranîn, Laviniaya ku zehf hez ji hespan dike. Di rêzefilîmê de rola Laviniayê firehtir e ji rola xwe ya di kitêbê de. Kêfa

min ji wê yekê re tê, ji ber ku baş e di rêzefilmê de bêtir pûteyê bi jinan bidin! Her wiha, vê çêtirgirtinê encameke xwe ya giring a dîtir heye: Lavinia bi Tiuri re diçe. Ev ji Tiuri re dibe barekî serbar î giran: gotî Tiuri wê bi nameyê nehesîne, bi tenê şah destûrdar e ku bi naveroka nameyê bizanibe. Lavinia bo Tiuri xeternak e. Gelo Tiuri dikare bawerîya xwe bi wê bîne? Di heman katê de, Lavinia û Tiuri bere bere yek û du pirr baş nas dikin, ev jî rê li ber hestên cîyawaz xweş dike. Rola firehtir a Laviniayê bi vî awayî tengijaneke zêdebar di rêzefilmê de dabîn dike. Ku her du bere bere yek û du baştir nas dikin – dema ku hûn bi hev re rêwîtiyê dikin, hûn bere bere bêtir nêzîkî yek û du dibin – tengijan bi rastî jî hîn girantir dibe, ji ber ku her du her gav bêtirî demên tenêbûnê di metirsîyê de ne.

Bi ser de jî, raza ku Tiuri li ser xwe digerîne zêdetir wî dike tenê. Ti kes bi erka wî nizane yan jî jê fam nake: bo çi yek hilde ji bo nameyeke ku bi naveroka wê nizane jîyana xwe bavêje ber metirsîyê?

## **Tonke Dragt**

## *Sıwarçakên Şah Dagonautî*

Ev çîrok çîrokeke binê zemanan e, zemanê ku sıwarçak li welatan ji xwe re digerîyan û disimsimîn. Çîrok li du şahînşahîyan diqewime: welatê Şah Dagonautî, yê li rojhilatê Çîyayên Gewre, û welatê Şah Unauwenî, yê li rojavayê Çîyayên Gewre. Paytextên van her du der û dîyaran jî navên xwe ji şahên xwe girtine: Bajarê Dagonautî û Bajarê Unauwenî. Welatekî sêyem jî di vê çîrokê de roleke giring digêrre, lê niha ne wexta çîrokên wê deverê ye.

Ev rîwayet li Şahînşahîya Dagonautî dest pê dike. Lê pêşî we yê pêdivî be ku hûn der barê Şah Dagonautî û sıwarçakên wî de bêtir xwedanagehî bin û, bila ev di bîra we de be, min çendek rûpelên li ser babetê ji kitêbeke qewî kevn rûnivîs kirin:

‘Şah Dagonautê me şahekî bi qas û qudret e; serdestîya wî kana êqil û dad û ‘edaletê ye, wisa jî welatê wî, bi gir û gazan û mêrg û çîmanan, zevîyên bi xêr û bêr, robarên bilemelem û mêşe û daristanên bêserî û bêbinî ve, berfireh û bedew e. Li bakur çîya hene û çîyayên hela hê bilindtir jî li rojava hene. Ji wan çîyayan û bi wê de welatê Şah Unauwenî ye, der û dîyarekî ku tê de dengbêjên me kilamên ‘ecêb rind dibêjin. Berek rojhilat û başûr, ‘erd tehtevelkîtir e, pê re jî dijmin ji van deveran de carinan lê dixebitin ku welatê me dagîr bikin, çima ku dihesidin ji dewlemendîya ku me heye. Lê heta niha ji ti kesî nehatiye vî der û dîyarî zêft bike, ji ber ku sıwarçakên şahî bi xweşîkî wî diparêzin û bi dilêrî berevaniyê jê dikin. Di nava tixûbên me de, jîyan xweş e, her tişt ewle û aram e.

Li jêr xizmeta Şah Dagonautî gelek sıwarçak hene, ku mêrên cegerpola û netirs in û alî wî dikin da ku ew şahînşahîyê bi rê ve behere û hifza pergal û nîzamê bike. Nav û dengên gelek ji van sıwarçakan li tevayîya welêt belav bûne. Heke bivê em navên çendekan bijimêrin, gelo kê ji me navê Sir Fantumarî û Tiuriyê Mêrxas û Ristridinê Başûrî nebihîstiye? Şahî bi pêş tîmarê ve ‘erd dane gelek sıwarçakên xwe, ên ku ew li ser navê wî bi kar tînin. Sıwarçak pabendî erkê ne ku bèn dema ku şah gazî wan bike, wekî bèn û bi hêz û şîyana xwe ve û bi peyayên xwe ve komekîyê bidine wî.

Di gel vê hindê, hindek sıwarçak ne xwedan ‘erd in; beşeke zore ji van peyayan hê jî xort in, lê dema ku bavên wan pîr bibin, ew ê dewsa bavên xwe bigirin. Her wiha sıwarçakên gerok jî hene, peyayên ku çu daxwaza wan nîne bibine xwedanên mal û milk û ha bi wir de û ha bi wê de di nava welêt de ji xwe re digerin û biçine kê derê jî, amadebaş in bo xizmetê, li ser tixûban abirriyê dikin û tew seferê dikêşine derveyê şahînşahîya me da ku deng û behsên welatên dûr û derez bi xwe re binin.

Dîyarê Şah Dagonautî gelek sıwarçakên xwe hene, hal û mede wiha, ne karekî hêsan e ku yek tevî refên wan bibe. Her peyayê ku dil hebe payeya sıwarçakîyê bi dest ve bîne, pêwîst e biselmîne ku bi xwe hêjayî wê payeyê ye. Pêdivî ye ew kes xwe bide ber şagirdîyeke dijwar, ku divê pêşî wekî dûajoyekî sıwarçakan xizmetê bike bo sıwarçakekî şareza, paşê jî saleke din pê ve tevî zêrevanên şahî bibe. Ne ku bi tenê pêwîst e sıwarçakek bikaribe çekan bi kar bîne û biselmîne ku ew di gelek biwaran de zîrek e, her wisa jî berîya her tiştî pêwîst e ew biselmîne ku ew mêrxasekî camêr û dev û dilê xwe yek, cegerpola û durist e. Pêwîst e di her babetê de ew sıwarçakane be.

Her ji çar salan carekê, çaxa çileyê havînê, Şah Dagonaut sıwarçakan hemûyan vedixwîne bajarê xwe yê ku ew heft rojan lê dimînin. Sıwarçak der barê rewş û bar û doxa li beşên curecur ên welêt de wî agehdar dikin û hesabê xwe didin der barê kar û xebatên xwe û serkeftinên xwe de.

Û di wê hefteyê de, di roja çileyê havînê de, şah bi şeweyekî rêwresmî payeya sıwarçakîyê dide peyayên xort ên ku hêjayî wê payeyê hatibine dîtin. Ew roj rojeke mezin e! Piştî rêwresmê, di metranxaneyê de ayînek tê gêrran, di pey re jî di qesrê de şahînetek tê danîn. Paşê rêpîvaneke fermî ya ‘ezamet di nava bajêr re bi rê ve diçe, ya ku sıwarçak hemû, serdanpê zirx û çek rabestî, bi meral û direwşên xwe ve, û bi pêşîkêşîya nûtirîn sıwarçakên xort, bi sıwarî tê de diçin. Welatîyên Dagonautî ji deveran hemûyan tèn da ku vê ahengê bibînin. Pîrozbayî ne ku bi tenê di qesrê de bi rê ve diçe, her

wisa jî li her dereke bajêr. Li çarsîyê pêşangehek tê lidarxistin, serê pêşîn di çaxa berbangê de û bi dû re li ber şewq û şemala bi sedan pêtalan, li kûçeyan hemûyan sazband amûrên xwe dijenin û gel ji xwe re distrê û direqise. Rojtirê, şah tîne peyayên xwe hemûyan dicivîne û siwarçakên nû destûrdayî dibin ku cara pêşîn beşdarî meclisa wan bibin. Û roja piştî wê jî, ew beşdarîyê li pêşbirkeke gewre dikin, a ku di nezera gelek kesan de peroşbexstirîn beşa hefteyê ye. Çu kes nikare li çu dereke dîtir a li wî dîyarî şewket û seltene û siwarçakîya bi wî rengî, dilêrî û çelengîya bi wî rengî, hemûyan li yek cîyî bibîne.

Lê berîya wan rojên şikûdar, pêdivî ye ku siwarçakên xort di taqîyeke dawîn de bi ser bikevin. Berîya rêwresma wergirtina payeya siwarçakîyê, divê ew bîst û çar saetan rojîyê bigirin. Destûra wan nîne parîyekî tişteki bixwin yan jî dlopekê tişteki vexwin. Û gotî ew di şapeleke biçûk a li hêseta bedenên bajêr de bikevine xelwetê, bîponijîn û şevê di wir de derbas bikin. Peyayên xort şûrên xwe datînine ber pêşkêşgehê û, cil û bergên spî li wan, tînin çong vedidin da ku serê xwe bi wê erka mezin biêşînin, a ku li benda wan e. Ew li ber in ku wekî siwarçakên Dagonautî bi dilsozî bi kêrî xizmeta şahê xwe bîn, pê re jî berevanîyê ji şahîşahîya wî û nîştimanê xwe bikin. Ew ji xwe re sondê dixwin ku ew ê her tim durist û babetî siwarçakîyê bin û şer bikin di rêka başîyê de. Siwarçak şev pê ve hişyar dimînin û bîra xwe vedidin, dua û dirozgeyan dikin da ku bi xurtî bi erka xwe rabin. Ew ne destûrdayî ne ku rakevin yan jî bipeyivin, yan jî dêhn û bala xwe bidine kesên li derveyê şapelê, heta ku şandeyeke siwarçakên şahî di saet heftê sibehê de were û wan behere hafa şahî.

Ev çîrok di şeveke wiha de, di şapeleke biçûk a li ser girê li dêrisê Bajarê Dagonautî de dest pê dîke, li dera ku pênc peyayên xort şeva berîya rêwresma xwe ya wergirtina payeya siwarçakîyê bîra xwe vedida û şev derbas dikir. Navên wan Wilmo, Foldo, Jioesipu, Arman û Tiuri bûn. Tiuri temenxxorttirînê wan bû; ew hê teze şanzdeh salî bû.



**BEŞA YEKEM**

**Erkdarkirin**

## *1 Nobeda şevê ya di şapelê de*

Tiuri, bi çavine ku zûr dinihêrîn li pêta melûl a mûma li pêşberî xwe, çong veda ser zemînê kevir ê şapelê.

Gelo saet çend bû? Gotî wî bi rijdî serê xwe biêşanda bi erkên ku ew ê neçar bûya pê rabe çawa ku bibûya siwarçak, lê hişê wî timî li cîyine din bû. Carinan jî wî tê derdixist ku der barê tiştêkî de hindî serê derzîyê jî wî hizra xwe nedikir. Di heyrê de bû çî ka hevalên wî jî di wî halî de bûn yan na.

Wî hangava çav bi Foldo û Arman, bi Wilmo û Jioesipu xist. Foldo û Wilmo, her yekî zûr li mûma xwe dinihêrî, lêbelê Arman rûyê xwe di nava destên xwe de veşartibû. Jioesipu çik çong vedabû û zûr li jorê, li esrexê dinihêrî, lê paşê wî di cî de xwe livand û rasterast li nava çavên Tiuri nihêrî. Tiuri berê serê xwe jê guhest û dîsa ziq berê xwe da mûmê.

Gelo Jioesipu hizra çî dikir?

Wilmo livîya, sola xwe li ser zêmîn sîqand. Ên din gişan berê xwe da hêla ku ew lê bû. Wilmo posîde bû û piçekî şerm kir heçku.

*Çi qasî bê deng e, gote xwe Tiuri. Rabûme ranebûme ez çu caran bi bêdengîyeke bi vî rengî nehesîyame. Tiştê ku li min tesele dibe bes henaseya me ye, û dibe ku, heke ez rind guh bidimê, gupegupa dilê min bi xwe ye...*

Her pênc peyayên xort ne destûrdayî bûn ku şev pê ve, hema ji peyvekê re çî, ji hev du re tiştêkî bibêjin. Her wiha bo wan ji binî ve qedexe bû li gel cîhana derve peywendîyê daynin. Peyayên qesrê di pey wan re derîyê şapelê bi ser wan de radabû û dê derî dîsa venekirana heta sibehtirê, saet heftan, dema ku siwarçakên Şah Dagonautî dê bihatana ku wan beherin.

Sibehê çaxa beyanîyê! Tiuri ji wê gavê ve dikaribû rêpîvana fermî ya pîrozbayîyê di serê xwe de bisêwiranda: siwarçakên li ser piştê hespên xwe yên ku cilên zînên wan bi nayabî zîbende bûn, di destên wan de mertalên wan ên rengrengî û direwşên wan ên ku dimilmilîn. Wî anî xeyala xwe wekî di nava wan de ye, kihêlekî spehî dajo, mucmelen çarane û cewşen û zendane û mexferê di xerra di ber kiriye, kumzirxek û perikekî pêlpêlî daye serê xwe. Lê paşê wî serê xwe hejand da ku xwe ji wê rûyetê xelas bike. Wî pê dizanibû ku divê ew dav û telleyên derveyî yên siwarçakîyê neyne bîra xwe, lê di dewşê de divê sondê bixwe ku ew ê bibe mîrxasekî camêr û dev û dilê xwe yek, cegerpola û durist.

Ronîya mûmê kir ku çavên wî biêşin. Wî li pêşkêşgehê nihêrî, li dera ku her pênc şûr li berê danayî bûn. Mertal li raserê pêşkêşgehê dardakirî bûn, li ber ronîya mîlmilî ya mûman diteyisîn.

*Sibehê wê du siwarçak hebin ku dê heman armaya binemalî li ser wan be,* Tiuri gote xwe. *Bavo û ez bi xwe.* Navê bavê wî jî Tiuri bû û ew wekî Tiuriyê Mîrxas dihate naskirin. Gelo niha bavo hê jî hişyar bû, kurê xwe dianî bîra xwe? Hêvîya Tiuri ji wê hêvîyê bû wekî bibe siwarçakekî berkeftî bi qasî bavê xwe.

Paşê dilxuşûşîyeke dîtir li wî hukim kir. Lê heke yekî li dêrî bixista? Dê rê nedana wî û hevrêyên wî ku dêrî vekin. Tiştê hate bîra Tiuri ku Sir Fantumar, ê ku ew dûajoyê wî yê siwarçakîyê bû, zemanekî gotibû wî. Di henga nobeda wî ya şevê ya di şapelê de, hinekan gurm ha gurm li dêrî xistibû. Fantumar bi sê peyayên xort ên mayîn re li wê derê bûye û ti yekî ji wan jî neçûye derî venekiriye. Û baş jî bûye ku venekirine, ji ber ku ew di pey re pê hesîyane ku kesê li dêrî xistî yek ji xulamên şah bûye ku xwestiye wan biceribîne.

Tiuri dîsa li hevalên xwe nihêrî. Hevalên wî hê jî her bi wî awayî di cî de çong vedayî bûn. Wî pê dizanibû yeqîn wext ji nîvê şevê derbas bûye. Mûma wî hema hema helîyabû; a herî kin bû di nava her pênc mûman de. Belkî jî ji ber ku Tiuri li ber pencereyekê rûniştî bû, lewma. Şapel cîyek bû ku ceyran dikir û ji nişkê ve bayekî sar tê de dikire fizîni. *Gava ku mûma min damire,* wî di dilê xwe de got, *ez ê yeke din vênexim.* Wan ên din ê nikaribûya di tarîyê de wî bibînin, ku fikreke xweş bû, û nedikete şayîşê wekî bikeve xewê.

Gelo Wilmo di xew re çûbû? Na, wî bes derawaye xwe guhestibû, nexwe yeqîn ew hişyar bû.

*Ez nobeda xwe ya şevê bi layîqî derbas nakim,* di dilê xwe de got Tiuri. Wî destên xwe kîpî hev kirin û çavên xwe kutane şûrê xwe yê ku dê destûr bidanayê ew bi tenê ji bo dozeke heqane bi kar bîne.



Wî ji xwe re dubare kirin ew gotinên ku roja din gotî wî ji Şah Dagonautî re bigotana: “Ez sondê dixwim ku wekî siwarçakekî bi dilsozî xizmeta cenabê te bikim, her wisa jî xizmeta tevayîya tebaayê cenabê te û wan ên ku hewarîya xwe li min daxin. Ez sozê didim ku...”

Paşê wî bihîst ku teqînîyek jî dêrî hat. Kêswês kete her tiştî, lê ebeden guman tê de nebû. Her pênc peya nema hilmijîn, lêbelê sekinîn li her heman dera ku lê bûn.

Paşê teqînîyeke dîtir hat, ti yekî ne gotinek kir ne jî xwe ji cîyê xwe leqand.

Destikê dêrî çerixî û kire reqînî, lê bê guman derî radayî bû. Paşê bihîstin dengê pêgavan hêdîka bi dûr ket.

Her pêncan hemûyan pêk ve axînkek rahêla.

*Baş e, di dilê xwe de got Tiuri. Qewimî û kuta bû. Tu li wê ‘ecêbê, lê bi wî wisa hat heçku, bi maweya nobeda xwe ya şevê, ew her li benda vebirrîneke bi wî rengî mabû. Dilê wî bi dengê wisa bilind dikuta ku wî bawer dikir yeqîn ên din dikaribû bibihîsta. De lo, Tiuri, aram bibe, wî gote xwe. Ew bi tenê bîyanîyek bû ku haya wî ji nobeda me ya şevê tinebû, yan jî yekî ku dixwest me vêzar bike, yan jî me biceribîne.*

Lê dîsa jî, Tiuri bi şayîş li benda dengê dîtir ma. Mûma wî bi şewl û şîqav kire pirtepirt û paşê, kufînîyeke bêdeng jê çû, damirî, pê re jî tarîyê dor li Tiuri girt.

Gava ku wî li ser serê xwe fixaneke sivik bihîst, wî nema dizanibû çî ka hê çî qas dem tê ve çûye. Heçku yekî penc davêtine pencereyê!

Paşê jî wî dengê bihîst, dengê nerm bi qasî henaseyekê: “Bi navê Xwedê, dêrî veke!”

Tonke Dragt di 1930yî de li Îndonezyayê ji dayîk bûye. Dema ku danzdeh salî bû, di henga Şerê Cîhanê yê Duyem de di baregeheke Japonan de hate ragirtin, li wê derê li kaxizên wê bi lavayî û bi deynî peyda kirî wê kitêba xwe ya pêşîn nivîsî. Piştî şer, wê û malbata wê bar kir û hatine Hollendê, Dragt li wê derê bû mamostaya nîgarkêşiyê. Di 1962yan de wê navdartirîn çîroka xwe, *Nameya Ji Şah Re*, da weşandin, a ku Xelata Salê ya Kitêba Zarokan wergirt û bo şanzdeh zimanan hate wergerandin. Dûmayîka wê kitêbê, *Razên Daristana Hovistan*, di 1965an de hate weşandin, *Strana Heftan* jî di 1967an de, ku her du jî ji aliyê weşanxaneyê *Pushkin Children's Books* (Kitêbên Zarokan ên Pûşkîn) ve hatine weşandin. Di 1976an de Dragtê Xelata Dewletê ya Ji Bo Edebiyata Ciwanan wergirt û di 2001ê de payeya siwarçakîyê bi dest ve anî.

Tonke Dragt li Hollendê dimîne.